

Uppgifter B

Textpaket

Litteracitet

1 Steg 2 3

Elever som läser och skriver





Innehåll

Inledning.....	3
-----------------------	----------

Textpaket 1

Lejonet och räven.....	5
En karta över en ö.....	7
Skorpionen	9

Textpaket 2

Skorpionen	12
Den giriga mannen.....	14
Potatischips.....	16

Textpaket 3

Skorpionen	19
Potatischips	21
Sömn.....	23
Mjölk	25
Världens städer.....	27
Litteratur- och bildförteckning.....	29



Inledning

Detta häfte innehåller underlag för *Uppgifter B – Textpaket*. Uppgifterna använder du tillsammans med *Samtals- och dokumentationsunderlag B* och *Bedömningsunderlag för Uppgifter B*.

Instruktionerna för hur du genomför uppgifterna finns i *Samtals- och dokumentationsunderlag B*.

Dokumentera elevens svar på uppgifterna i bedömningsunderlagen. Var uppmärksam på att svarsrutorna för ”Ja” och ”Nej” kommer i en annan ordning på elevens svarsblad när språket har läsriktningen höger–vänster.

Varje uppgift består av två blad – en text och elevens svarsblad med läsförståelsefrågor. Information om hur du väljer uppgifter till eleven finns i lärarhandledningen (se s. 6–7). Skriv ut uppgifterna i färg och enkelsidigt så att eleven kan se texten och frågorna samtidigt.

Ge gärna tolken kopior av uppgifterna du har valt, både på svenska och på elevens språk.

Om översättningen

Översättningen använder den varietet och det språkbruk som hör hemma i norra Kurdistan (Turkiet, Irak, Syrien), med en modifierad variant av det latinska alfabetet. Talad kurmanji har i detta område flera olika dialekter. Olika talare kan därför uppleva att de inte känner igen ord eller fraser. Det betyder emellertid inte att de är felaktiga utan att det varit omöjligt att hitta en översättning som passar alla. Var därför särskilt uppmärksam på att eleven har förstått centrala ord i uppgifterna.

Anpassning av uppgifter för elever med funktionsnedsättning

Om du läser upp eller spelar in uppgifter för elever med svår synnedsättning behöver du anpassa uppgifter som innehåller bilder eller figurer. Kontakta en speciallärare eller specialpedagog om det behövs.

Textpaket 1

- Text 1. Lejonet och räven. Beskriv innehållet i bilden.
- Text 2. En karta över en ö. Uppgiften stryks.
- Text 3. Skorpionen. Beskriv skorpionen i bilden. (Ingår även i textpaket 2 och 3)

Textpaket 2

- Text 3. Potatischips. Använd riktiga potatischips. (Ingår även i textpaket 3)

Textpaket 3

- Text 3. Sömn. Figuren kan strykas. Frågorna 3 och 4 som bygger på information i figuren stryks.
- Text 5. Världens städer. Diagrammet kan strykas. Frågorna 2 och 4 som bygger på information i diagrammet stryks.

Läs mer i *Anpassning för elever med funktionsnedsättning*.

Textpaket 1



Şêr û rovî

Şêr di şikefta xwe de dirêjkirî bû.

Ew bi şev û roj li wir dirêjkirî bû.

Mirov tenê gurmijînên piçûk û westiyayî jê dibihîstin.

– Ew nexweş e, ajel fikirîn û heyfa wan lê hat.

Wan pest pê kir û bi diyariyên piçûk çûn nav şikefta şêr
Lê rovî neçû hundir.

Şêr bi dengekî nerm pirsî:

– Ji bo ci tu nayê, hevalê min? Yêñ din tev hatine vir.

– Ez fikirîm ku werim, rovî got, lê min li şopêñ lingan niherî û ez
tirsiyam. Hemû şop diçine nav şikefta te lê ci şop ji şikeftê
dernakevin. Ji ber hindê ez bes li derve radiwestim.



Pirs li ser "Şêr û rovî"


Di derbarê nivîsê de bersiva van pirsên jêrîn bide, Erê yan Na.

	Erê	Na
1. Ma şêr hertim di şikefta xwe de bû?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
2. Ma rovî çû hundir cem şêrî?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
3. Ma rovî diyarî da şêrî?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
4. Ma şêr ew ajelêñ din xwaribûn?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>

Tu bersiva pirsên jêrê devkî didî.

5. Ma tu dikarî bi gotinêñ xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser çi ye?
6. Ma tu bawer dikî ku şêr nexwes bû? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?
7. Ma rovî ji wan ajelêñ din biaqiltir bû? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?
8. Ma tu bawer dikî ku mirov dikare ji vê serpêhatiyê tiştekî hîn bibe? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?

Nexşeyeka giravekê



Pirs li ser ”Nexşeyeka giravekê”

Ji bo bersiva ku tu bawer dikî rast e, çeprastekê (X) li çargoşeyê bide. Tu bi tenê dikarî yek çeprastekê (X) lê bidî.

1. Kîjan ji van ciyan herî nêzîkî benderê ye?

- | | | |
|---|--------------------------|--------|
| A | <input type="checkbox"/> | Bajar |
| B | <input type="checkbox"/> | Gol |
| C | <input type="checkbox"/> | Çewlîk |

2. Kîjan ji van ciyan li bakurê bajêr e?

- | | | |
|---|--------------------------|------------|
| A | <input type="checkbox"/> | Balafirgeh |
| B | <input type="checkbox"/> | Daristan |
| C | <input type="checkbox"/> | Çewlîk |

3. Tu dê bi kîjan alî ve herî heke tu ji bajêr ber bi golê ve biçî?

- | | | |
|---|--------------------------|----------|
| A | <input type="checkbox"/> | Bakur |
| B | <input type="checkbox"/> | Rojava |
| C | <input type="checkbox"/> | Rojhilat |

4. Bifikire ku tu li giravê gerekê dikî. Li gor qaîdeyan here.

1. Ji gund dest pê bike.
2. Bide ser rêya ku ber bi benderê ve diçe.
3. Li ba xaçerêya duyem milê çepê bigire.
4. Berdewam bike hetanî rê xilas bibe.
5. Tu nuha li ku yi?

- | | | |
|---|--------------------------|--------|
| A | <input type="checkbox"/> | Çewlîk |
| B | <input type="checkbox"/> | Bajar |
| C | <input type="checkbox"/> | Bender |

Dûpişk-pîrikajela biderzî

Li navçeyên germ, fikreka nebaş e ku mirov tiliyên xwe têxe qulên piçûk yên dîwaran yan nav keviran. Mirov divê pêlavên xwe jî ku demeke dirêj newergirtî mabin, daweşîne. Ji ber ku dûpişk ji ronahiyê hez nakin, bi hêsanî, bi roj dikevin qul û cihêن din yên tarî û vedikevin. Dûpişk li welatên germ, li tevayê cîhanê dijîn lê mirov kêm caran wan dibîne.

Bi pêvedanê nêçîra xwe dikuje

Dûpişk dibin ku pir bijehrî bin, digel ku piraniya cûreyên wan ji bo me mirovan ne yên kuştinê ne. Ew ji yek heta bîst santîmetreyan dirêj dîbin, girêdayî ka ew ji kîjan cûreyî ne lê di taliya boçika hemûyan de derziyeke jehrê heye. Dema ku dûpişkek dê nêçîrê bikuje, ew boçika xwe bi jor ve, bi ser pişta xwe ve ditewîne û bi nêçîrê vedide ya ku ew bi pencikên xwe zeft dike. Dûpişkekê tirsiyayî li hawîrdorê zû dizivire ji bo ku hertim berê derziya xwe bide neyarî.

Dûbişk bi şev nêçîra pîrpîrokên mezin û kêzikên din yên piçûk dike. Ew bi pencikên xwe hîs dikin, nêçîra xwe diguvêşin û bi derziya xwe ya jehrê wê dikuje.



Dûpişk

Pirs li ser "Dûpişk-pîrikajela biderzî"

Di derbarê nivîsê de bersiva van pirsên jêrîn bide, Erê yan Na.

	Erê	Na
1. Ma dûpişk ji tarîtiyê hez dikin?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
2. Ma <i>hemû</i> dûpişk dikarin mirovan bikujin?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
3. Ma <i>hemû</i> cûreyên dûpişkan wek hev mezin in?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
4. Ma dûpişk bi pençikan nêçîra xwe digirin?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>

Tu bersiva pirsên jêrê devkî didî.

5. Ma tu dikarî bi gotinêن xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser çi ye?
6. Di nivîsa di derbarê dûpişkan de dibêje ku mirov divê pêlavêن xwe daweşîne. Tu bawer dikî ji bo çi divê mirov wê bike? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?

Textpaket 2



Dûpişk-pîrikajela biderzî

Li navçeyên germ, fikreka nebaş e ku mirov tiliyên xwe têxe qulên piçûk yên dîwaran yan nav keviran. Mirov divê pêlavên xwe jî ku demeke dirêj newergirtî mabin, daweşîne. Ji ber ku dûpişk ji ronahiyê hez nakin, bi hêsanî, bi roj dikevin qul û cihêن din yên tarî û vedikevin. Dûpişk li welatên germ, li tevayê cîhanê dijîn lê mirov kêm caran wan dibîne.

Bi pêvedanê nêçîra xwe dikuje

Dûpişk dibin ku pir bijehrî bin, digel ku piraniya cûreyên wan ji bo me mirovan ne yên kuştinê ne. Ew ji yek heta bîst santîmetreyan dirêj dîbin, girêdayî ka ew ji kîjan cûreyî ne lê di taliya boçika hemûyan de derziyeke jehrê heye. Dema ku dûpişkek dê nêçîrê bikuje, ew boçika xwe bi jor ve, bi ser pişta xwe ve ditewîne û bi nêçîrê vedide ya ku ew bi pencikên xwe zeft dike. Dûpişkekê tirsiyayî li hawîrdorê zû dizivire ji bo ku hertim berê derziya xwe bide neyarî.

Dûbişk bi şev nêçîra pîrpîrokên mezin û kêzikên din yên piçûk dike. Ew bi pencikên xwe hîs dikin, nêçîra xwe diguvêşin û bi derziya xwe ya jehrê wê dikuje.



Dûpişk

Pirs li ser "Dûpişk-pîrikajela biderzî"

Di derbarê nivîsê de bersiva van pirsên jêrîn bide, Erê yan Na.

- | | Erê | Na |
|--|--------------------------|--------------------------|
| 1. Ma dûpişk ji tarîtiyê hez dikin? | <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |
| 2. Ma <i>hemû</i> dûpişk dikarin mirovan bikujin? | <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |
| 3. Ma <i>hemû</i> cûreyên dûpişkan wek hev mezin in? | <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |
| 4. Ma dûpişk bi pençikan nêçîra xwe digirin? | <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |

Tu bersiva pirsên jêrê devkî didî.

5. Ma tu dikarî bi gotinên xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser çi ye?
6. Di nivîsa di derbarê dûpişkan de dibêje ku mirov divê pêlavêne xwe daweşîne. Tu bawer dikî ji bo çi divê mirov wê bike? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?

Zilamê çekûs

Zilamekê çekûs hemû tiştên xwe firotin û pereyên zêr helandin û kirin gilokeka mezin. Wî ew giloka zêr di baxçeyê xwe de, di ber qurmê darekê de xiste binê erdê. Wî her roj serdana darê dikir. Rojekê yek ji cîranan ew dît û rasterast fêhm kir ku ew ci dike. Dema zilamê çekûs çû, ji cîran re bû delîve û giloka zêr ji bin erdê derxist û bi xwe re bir.

Dema zilamê çekûs, roja din ji bo ku li xezîna xwe miqate be, hat, qulekê dît. Wî dest pê kir û giriya û ji bêçaretiya xwe porê serê xwe hilkışand. Hevalekî wî ku di wir de derbas dibû mereq kir ka ci qewmiye. Zilamê çekûs jê re got ku ci hatiye serê wî.

- Wey, tiştekî din nebû, hevalê wî got. Sebeb tuneye ku tu xemgîn bibî. Ji ber ku giloka zêr di rastiyê de qet nebûbû ya te. Kevirekî bigire û di şûna wê de bixe qulê û hesab bike ku ew giloka zêr e. Tu dê her eynî kêf û feydeyê jê bikî.

Pirs li ser "zilamê çekûs"

Ji bo bersiva ku tu bawer dikî rast e, çeprastekê (X) li çargoşeyê bide. Tu bi tenê dikarî yek çeprastekê (X) lê bidî.

1. Zilamê çekûs giloka zêr çewa bi dest xist?

- A Wî ji ciranî kirîbû.
- B Wî ji pereyan çekiribû.
- C Wî di baxçeyî de ditibû.

2. Çima Zilamê çekûs her roj diçû ba darê?

- A Ji bo ku zêdetir zêr bixe binê erdê.
- B Ji bo ku zêrê xwe ji binê erdê derbixe.
- C Ji bo ku çavdêriya zêrê xwe bike.

3. Mirov ji vê çîrokê dikare fêrî ci bibe?

- A Ku mirov dewlemendiya xwe parve bike.
- B Ku mirov bi tenê ji dewlemendiya ku tê bikaranîn kîfî dike.
- C Ku mirov divê her dem guhdariya cîran û hevalên xwe bike.

Tu bersiva pirsên jêrê bi devkî didî.

4. Ma tu dikarî bi gotinê xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser ci ye?
5. Ma tu dibêjî gelo çima zilamê çekûs hemû tiştên xwe firotin? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?
6. Çima hevalê wî digot, di şûnê de kevirekî bixe qulê? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?

Çîpsêن petata

Çîpsêن petata, qetêن tenik û qelandî en petatan e û ji îcadêñ herî behskirî yên sedsala 1800an e. Serpêhatiyêñ di derbarê ka kî ew îcad kiriye û dest bi firotina wê kiriye de pir in. Hema hema ne mumkun e ku biryar were dayin ka ji van serpêhatiyan kîjan xwediyyê rastiyê ye.



Çîpsêن petata

Serpêhatiya herî belavbûyî di derbarê George Crum de ye, 24ê tebaxê sala 1853an, Crum hewil da ku mişteriyek nerazî aram bike. Wî petatan tenik qetkirin, qelandin, pişt re şor kir, mişterî ji nerazîbûnê giha dilşadiya zêde. Ev serpêhatî dibe ku pir rast be, eşkere ye ku xwarênpêjên din ji, di heman sedsalê de gihîştine heman dîtinê. Tenê li Amerîkayê, di çend kitêbêñ xwarinê de dihê behskirin û şêweyêñ din li Bîrîtanya Mezin hat bipêşvebirin.

Pêşî di 1890 ï de dest pê hat kîrin çîps di dikanêñ xwarinê de hatin firotin û zêdebûna rastî, ya afirandina çîpsê û firotinê di pey îcada frîtosê de dest pê kir ku di dawiya 1920 ï de keşif kirine, hesan kir. Di dawiya dehsalêñ hatî de, ambalaj ji hatin guhertin, wisan bû ku çîps li deverên dûrî Amerîkayê ji hat belav kîrin. Li hêla Ewrûpayê, pêşketina çîpsê di dikanan de, pişti 1950 ï dest pê kir.

Pir li ser ”çîpsêñ petata”

Ji bo bersivêñ ku tu bawer dikî rast e, çeprastekê (X) li çargoşeyê bide. Tu bi tenê dikarî yek çeprastekê (X) lê bidî.

1. Ji bo çi nivîskar vê nivîsê nivîsiye?

- A Ji bo ku di derbarê çîpsêñ petata de agehdarî bide xwendevanî.
- B Ji bo ku bi serpêhatiyeka xweş kêfa xwendevanî bîne.
- C Ji bo ku xwendevanî hîn bike ka mirov çawan çîpsêñ petata çêdike.

2. Mirov dizane ku kê çîpsa petatan ïcad kiriye?

- A Belê, George Crum bû.
- B Na, kesêñ li ser dihê fikirkirin pir in.
- C Na, lê mirov dizane li kur ïcad bûye.

Di nivîsa li ser çîpsê de kîjan dîtîn rast e? Di pey her dîtinekê de çeprastekê li Erê yan Na bide.

Erê Na

3. Em dizanîn kêmzêde ji kengê ve mirov çîpsa petata xwariye.

4. Ewrûpa yekemîn beşa cîhanê ye ku mirov çîpsa petata li wir firot.

5. Ji yekî zêdetir sebeb hene ku mirov di 1900 î de dest bi xwarina çîpsa petata kiriye.

Tu bersiva pirsêñ jêrê devkî didî.

6. Ma tu dikarî bi gotinêñ xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser çi ye?

Textpaket 3



Dûpişk-pîrikajela biderzî

Li navçeyên germ, fikreka nebaş e ku mirov tiliyên xwe têxe qulên piçûk yên dîwaran yan nav keviran. Mirov divê pêlavêن xwe jî ku demeke dirêj newergirtî mabin, daweşîne. Ji ber ku dûpişk ji ronahiyê hez nakin, bi hêsanî, bi roj dikevin qul û cihêن din yên tarî û vedikevin. Dûpişk li welatêن germ, li tevayê cîhanê dijîn lê mirov kêm caran wan dibîne.

Bi pêvedanê nêçîra xwe dikuje

Dûpişk dibin ku pir bijehrî bin, digel ku piraniya cûreyên wan ji bo me mirovan ne yên kuştinê ne. Ew ji yek heta bîst santîmetreyan dirêj dîbin, girêdayî ka ew ji kîjan cûreyî ne lê di taliya boçika hemûyan de derziyeke jehrê heye. Dema ku dûpişkek dê nêçîrê bikuje, ew boçika xwe bi jor ve, bi ser pişta xwe ve ditewîne û bi nêçîrê vedide ya ku ew bi pencikên xwe zeft dike. Dûpişkekê tirsiyayî li hawîrdorê zû dizivire ji bo ku hertim berê derziya xwe bide neyarî.

Dûbişk bi şev nêçîra pîrpîrokên mezin û kêzikên din yên piçûk dike. Ew bi pencikên xwe hîs dikin, nêçîra xwe diguvêşin û bi derziya xwe ya jehrê wê dikuje.



Dûpişk

Pirs li ser "Dûpişk-pîrikajela biderzî"

Di derbarê nivîsê de bersiva van pirsên jêrîn bide, Erê yan Na.

	Erê	Na
1. Ma dûpişk ji tarîtiyê hez dikin?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
2. Ma <i>hemû</i> dûpişk dikarin mirovan bikujin?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
3. Ma <i>hemû</i> cûreyên dûpişkan wek hev mezin in?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
4. Ma dûpişk bi pençikan nêçîra xwe digirin?	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>

Tu bersiva pirsên jêrê devkî didî.

5. Ma tu dikarî bi gotinêن xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser çi ye?
6. Di nivîsa di derbarê dûpişkan de dibêje ku mirov divê pêlavêن xwe daweşîne. Tu bawer dikî ji bo çi divê mirov wê bike? Tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?

Çîpsêن petata

Çîpsêن petata, qetêن tenik û qelandî en petatan e û ji îcadêñ herî behskirî yên sedsala 1800an e. Serpêhatiyêñ di derbarê ka kî ew îcad kiriye û dest bi firotina wê kiriye de pir in. Hema hema ne mumkun e ku biryar were dayin ka ji van serpêhatiyan kîjan xwediyyê rastiyê ye.



Çîpsêñ petata

Serpêhatiya herî belavbûyî di derbarê George Crum de ye, 24ê tebaxê sala 1853an, Crum hewil da ku mişteriyek nerazî aram bike. Wî petatan tenik qetkirin, qelandin, pişt re şor kir, mişterî ji nerazîbûnê giha dilşadiya zêde. Ev serpêhatî dibe ku pir rast be, eşkere ye ku xwarênpêjên din ji, di heman sedsalê de gihîştine heman dîtinê. Tenê li Amerîkayê, di çend kitêbêñ xwarinê de dihê behskirin û şêweyêñ din li Bîrîtanya Mezin hat bipêşvebirin.

Pêşî di 1890 ï de dest pê hat kîrin çîps di dikanêñ xwarinê de hatin firotin û zêdebûna rastî, ya afirandina çîpsê û firotinê di pey îcada frîtosê de dest pê kir ku di dawiya 1920 ï de keşif kirine, hesan kir. Di dawiya dehsalêñ hatî de, ambalaj ji hatin guhertin, wisan bû ku çîps li deverên dûrî Amerîkayê ji hat belav kîrin. Li hêla Ewrûpayê, pêşketina çîpsê di dikanan de, pişti 1950 ï dest pê kir.

Pir li ser ”çîpsêñ petata”

Ji bo bersivêñ ku tu bawer dikî rast e, çeprastekê (X) li çargoşeyê bide. Tu bi tenê dikarî yek çeprastekê (X) lê bidî.

1. Ji bo çi nivîskar vê nivîsê nivîsiye?

- A Ji bo ku di derbarê çîpsêñ petata de agehdarî bide xwendevanî.
- B Ji bo ku bi serpêhatiyeka xweş kêfa xwendevanî bîne.
- C Ji bo ku xwendevanî hîn bike ka mirov çawan çîpsêñ petata çêdike.

2. Mirov dizane ku kê çîpsa petatan ïcad kiriye?

- A Belê, George Crum bû.
- B Na, kesêñ li ser dihê fikirkirin pir in.
- C Na, lê mirov dizane li kur ïcad bûye.

Di nivîsa li ser çîpsê de kîjan dîtîn rast e? Di pey her dîtinekê de çeprastekê li Erê yan Na bide.

Erê Na

3. Em dizanîn kêmzêde ji kengê ve mirov çîpsa petata xwariye.

4. Ewrûpa yekemîn beşa cîhanê ye ku mirov çîpsa petata li wir firot.

5. Ji yekî zêdetir sebeb hene ku mirov di 1900 î de dest bi xwarina çîpsa petata kiriye.

Tu bersiva pirsêñ jêrê devkî didî.

6. Ma tu dikarî bi gotinêñ xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser çi ye?

Xew

Pêwîstiya hemûyan bi xewê heye, ci însan ci heywan. Lê ji bo ci? Lêkolîner jî bersivê nizanin. Yan jî, di dema razana me de ci dibe. Lê pêwîst e ku em razên, tu şik tê de tune, bê razan em dimirin.

Xew cûreyekî bêhnvedanê ye. Tevî ku haya te jê tuneye ka li hawîrdora te ci dibe. Ji hin aliyan ve meriv dikare bêje ku dema tu radizî, tu ji hiş ve çûyî. Lê ne ewqas kûr ku tu nikaribî jî xewê bêyî şiyarkirin.

Çerxa xewê

Xew di çerxên vejerok de pêk tê, dibe ku ew jî nêzî 90 deqîqeyan dirêj bin. Her çerxeka xewê ji pênc pêngavan pêk tê, li diyagrama di derbarê çerxa xewê de binêre.


Xewaxewnan û xewakûr

Navê pêngava pêncem xewaxewnan e. Wê demê çav xwe zû dilivînin û em wê demê xewnan dibînin. Xewaxewnan di rûyî re ye ango em ewqas kûr ranazên. Xewaxewnan her 90 deqîqeyan û carekê bi şûn de tê û di nêzîkî jî çaran yek, ji dema xewa me de didomîne. Pêngaveka din xewakûr e. Wê demê laş bi ser xwe ve tê û em xwe baştir hînî tiştên nû dikin. Di dema xewakûr de zanîn xurt dibin heta ku ew tiştên herî hesan jî, di hiş de dimînin.

Cîdagirtina xewlêçûyînê

Heke tu rojekê gelek dereng razayî gelek hêsan e ku mirov bawer bike ku şeva pişt re pêwîstiya te pê heye ku tu duqat razeyî. Lê ev ne rast e. Laş gelek baş ciyê xewa hundakirî dadigire. Dema tu kêm razayî, tu kûrtir radizeyî jî bo ku şûna wê dabigirî.

Çerxa xewê



Pirs li ser "Xew" ê

Kîjan îdîa li tiştê ku di nivîsê de, li ser xewê hatiyê nivîsandin, tê? Piştî her îdîayekê çeprastekê (X) li çargoşeya Erê yan Na bide.

- | Erê | Na |
|--------------------------|--------------------------|
| <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |
1. Lêkolîner dizanin çima xew ji mirovan re pêwîst e.
 2. Mirov di xewaxewnan de sivik radizê.
 3. Em di piraniya şevê de xewnan dibînin.
 4. Şiyarbûna berî xewaxewnan ji şiyarbûna piştî xewaxewnan hêsanter e.

Hevokê berdewam bike. Ji bo bersiva ku tu bawer dikî rast e, çeprastekê (X) li çargoşeyê bide. Tu bi tenê dikarî yek çeprastekê (X) lê bidî.

5. Heke mirov şevekê yan jî du şevan hindik razabe....

- A pêwîst e mirov şeva bê duqat razê ji bo ku ciyê xewê dabigire.
- B laş dikare şeva bê, wê bi rêya razana kûr telafî bike.
- C divê mirov êvara bê gelek zûtir here û têkeve nav nivînan ji bo ciyê xewa lêbihurî dabigire.

Tu bersîva vê pirsa tê devkî didî.

6. Ma tu dikarî bi gotinên xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser çi ye?

Şîr

Ji xwendevanan bo rojnameyekê

Li Swêdê hemû xwendekar li dibistanê firavînê dixwin û digel xwarinê pir caran şîr dihê servîskirin. Di demên dawîn de dest pê hatiye kîrin minaqeşe dibe, gelo bi rastî vexwarina şîr baş e. Li vir tu dikarî bixwînâ ka du kesen cuda ci difikirin.

1.

Avê bide zarokêñ dibistanê, di şûna şîr de

Şîrê çêlekan li dibistanê ne xwezayî ye. Mirov li cîhnê yekemîn celeb e ku şîrê celebek din serf dike.

Lêkolîneke berfireh ji universiteya Uppsalayê ku me dikarîbû roja çarsemê, di derbarê de, di rojnameyê de bixwenda nişandanen me yên berê, bêrexne li ser şîr, serûbin dike. Lêkolîvanan kîfîskirine ku kurtejiyan u hestîşikestina pir, bi zêdevexwarina şîr ve girêdayî ye.

Şîrê manga ji bo laşsaxiya civatê û jîngehê ne xwezayî û ne ji baş e. Ji ber vê yekê dem hatiye ku em şîrê manga ji dibistanen swêdî rakin û di şûnê de zarakan fêri vexwarinê din yên nû bikin, ku ji bo jngehê baştir e: angotibûnê bi avê vemirîne.

Anders Svensson

Nûnerê komela Bêgoşt bixwe.

2.

Li dibistanê şîr digel xwarinê pêwîst e

Bersiv bo Anders Svensson

Anders Svensson naxwaze ku zarok li dibistanê şîr vexwin. Em û YN tam berevajî difikin - hemû zarok li dibistanê hêjayî şîrê belaş in.

Di naveroka şîr de ji 22 madeyêñ adanê 18 ku her roj pêwîstiya me pê heye, hene û di derbarê adanê de piştrastiyeke mezin e, di dema roja zarakan de, li dibistanê. Li welatêñ ku kîmasiya xwarinê lê heye, ji bo pir zarakan şîrê dibistanê dikare bibe çavkaniyeke jiyanê bo adanê. Digel vê, lêkolînen nû nişan dane ku adanê naveroka firavîneke dibistanê têr nake heke zarok digel xwarinê şîr negirin.

Lêkolînera adanê Ulla Rosander li Högskolana Kristianstadê, li sê dibistanen bajerekî Swêdê, naveroka adanê di wê xwarina dibistanê de ku zarokêñ dehsalî di heftiyekê de xwarine, analîs kiriye. Listeya firavîna dibistanan wek hev bûye. Encaman diyar kiriye ku vexwarina şîr digel xwarinê ji bo zarakan girîng e û ji bo zarokêñ ku hindik xwarinê dixwin yan ji yên ku pê re nagihîjin di navbira firavînê de têr bixwin, zêde girîng e. Şîr ji bo zarok kalsiumê ji têr bistîne, vitamîn B12 û magnesium pêwîst e. Ji ber hindê, cîhekî şîr bêguman li dibistanê heye.

Petra Strandberg

Nûnera gundiyêñ şîr Swêd

Pirsên "ji xwendevanan bo rojnameyekê"

Ji bo bersiva ku tu bawer dikî rast e, çeprastekê (X) li çargoşeyê bide. Tu bi tenê dikarî yek çeprastekê (X) lê bidî.

1. Ji bo ci Strandberg bawer dike ku şîr ji bo zarokêñ dibistanê girîng e?

- A Şîr dike ku zarok li dibistanê zêde bixwin.
- B Şîr dike ku mirov zêdetir bijî.
- C Di naveroka şîr de pir madeyêñ adanê hene.

2. Ji bo çô Svensson bawer dike ku zarokêñ dibistanê bila di cihê şîr de avê vexwin?

- A Av ji şîr erzantir e.
- B Av ji bo jîngehê baştır e.
- C Av tîbûnê baştır divemirîne.

3. Li gor nivisan, lêkolînê ci nîşan daye?

- A Ku di vexwarina şîr de hem tesîra baş û hem ji ya nebaş heye.
- B Ku di xwarina dibistanê de bêy şîr naverokeka adanê a têr û zêde ye.
- C Ku bi zêdevexwarina şîr hestî qewitir dîbin.

4. Ji bo ci Stranberg di rojnameyê de dinivise?

- A Ew dixwaza bibêje ka ji bo ci ew bawer dike ku Svensson şaş e.
- B Ew dixwaze bibêje ji bo ci av baş e ji bo jîngehê.
- C Ew naxwaze ku zarok li dibistanê hindik xwarin bixwin.

Kîjan îdîa, ci di nivîsêñ li ser şîr hatine nivîsandin, digunce? Di pey her îdîayekê de çeprastekê ji bo Erê yan Na deyne çargoşeyê.

Erê Na

- | | | |
|---|--------------------------|--------------------------|
| 5. Svensson îdîa dike ku mirov pir zêde şîr vexwe kurttir dijî. | <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |
| 6. Svensson û Strandberg di nivîsêñ xwe de işaretî heman lêkolînvanê dîkin. | <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |
| 7. Xuya ye ku lêkolînvan di derbarê tesîra şîr de hemfikîr in. | <input type="checkbox"/> | <input type="checkbox"/> |

Pirsên jêrê tu devkî bersiv didî.

8. Ma tu dikarî bi gotinêñ xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser ci ye?
9. Kîjan nivîsê herî zêde tu îqna kirî? Ma tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?

Bajarêن cîhanê hîn zûtir mezintir dibin

Bajarvanîbûn li cîhanê bi hawayekî hîn bi leztir berdewam e. Li gor pêşbîniyên YN, li bendê ye ku jîmara bajarîya bi tevahî zêde be, di sala 2050 î de bigihîje 2,4 mîlyaran û ji bo ku hemû cîh bigrin, dibe ku bajar xwe li ser qadeka weke ya Hindistanê fereh bikin

Di sedsala 1900 î de, jîmara xelkêن seranserî cîhannê ku li bajaran dijîyan zêde bû, ji 220 mîlyonan gîhişt 2,8 mîlyar mirovan û di 2008 de li gor YN, ev cara yekem e ku piraniya mirovan ne li gundan, li bajar û herêmên şen dijîn.


Di 2013an de bajarîyên cîhanî nêzî 3,6 mîlyar niştecî hatin texmînkirin, lê li gor pêşbîniyên YN li bendê ne ku di 2030 î de bigihîje nêzî 5 mîlyaran û di 2050 î de, ji 6 mîlyaran zêdetir bibe. Li Ewrûpa, bakur û başûrê Amerîkayê ji niha ve piraniya gel li bajar û herêmên şen dijîn, dema ku Afîka û Asya bi biheycan rûbirûyi zêdebûna bajaravakirinê ne.

Mezinbûna bajaran hem astengî ye û hem jî îmkan e

Mezinbûna bajaran di pir hêlan de zahmetiyeke mezin e ji ber ku bajarîbûna biley ber bi pirsgirêkên pizîskî û yên jîngehê ve diçê. Bo nimûne: dibe ku di derbarê qirêjiya hewayê û mercêñ kîmasiyên hîjîyenê de be. Di heman demê de mezinbûna bajaren mezin firsetine ku li gundan tunin, pêşkêşî pir mirovan dike, mîna pir îmkanêñ kar, baştir laşsaxî û lînêrîna nexweûiyan û firsetêñ xwendinê.

Ku pir mirov bi şenayî bijîn, dihê wateya kêmkirina enerjî û çûnûhatinê ji, ku di heman demê de dikare alîkariya kêmkirina giraniya li ser iklîmê bike.

Di cîhanê de zêdebûna nişteciyan 1961-2012 û pêşbîniya 2013-2050



Pirsên ji "Bajarêن cîhanê hîn zûtir mezintir dibin"

Ji bo bersiva ku tu bawer dikî rast e, çeprastekê (X) li çargoşeyê bide. Tu bi tenê dikarî yek çeprastekê (X) lê bidî.

- 1. Li gor nivîsê, tesîra herî pêşîn a neyînî kîjan e ku mirov malê bar dikine bajaran?**
 - A Li bajaran jîngeh gemarî dibe.
 - B Bajar mezin dibin.
 - C Pêwîstiya çûnûhatinê zêde dibe.

- 2. Mirov bawer dike ku sala 2040 î dê nêzî çend mirovan li bajaran bijîn?**
 - A Nêzî 6,4 mîlyar
 - B Nêzî 3,6 mîlyar
 - C Nêzî 5,7 mîlyar

- 3. Li gor nivîsê, kîjan tesîra herî pêşîn e ku nişteciyên bajaran zêde dibin?**
 - A Li bajaran jîngeh xweştir e.
 - B Li bajaran mercên jiyanê bastır in.
 - C Malbarkirina bo bajaran hêsanter e.

- 4. Parvebûna nişteciyên cîhanê di navbera bajar û gundan de di 1961ê de çawa bû?**
 - A Nêzî du caran zêdetirî bajaran mirov li gundan dijiyan.
 - B Piraniya mirovan zêdetir li bajaran dijiyan ne li gundan.
 - C Jimara mirovên li gund û bajaran dijiyan wek hev bû.

Tu bersiva van pirsên jêrê devkî didî?

5. Ma tu dikarî bi gotinên xwe, bi kurtî behs bikî ka ev nivîs li ser ci ye?
6. Di nivîsê de dibêje ku dê pir û pir li bajaran bijîn. Tu bawer dikî ku dê hêlîn baş yên jiyana gundan hebin? Ma tu dikarî hîngê behs bikî tu çewa difikirî?

Litteraturförteckning

Aisopos. Den girige. I: *Aisopos' fabler*. Ny översättning av Erik Hedén med illustrationer av Arthur Rackham. 1919. Stockholm: Svenska andelsförlaget. (bearbetad)

Aronsson, Karin & Stellan Ottosson, 1993. Lejonet och räven. I: K. Aronsson & S. Ottosson; illustrationer I-K Eriksson & M. Korotyńska, *Min läsebok Blå rosen*. 2:a uppl. Stockholm: Liber. (bearbetad)

Borgström, Håkan, 2010. Sover kroppen när du sover? I: H. Borgström. 2010. *Kroppens mysterier*. Enskede: Borgströms Förlag. (bearbetad)

Carlberg, Jonas, 2014. Mjölken behövs till skolmaten. *Upsala Nya tidning*. Insändare. Publicerad 2014-11-11. (bearbetad)

En karta över en ö. Kartan och frågorna anpassade från IEA Reading Literacy Study. © 1990. International Association for the Evaluation of Educational Achievement (IEA). The Hague: International Association for the Evaluation of Educational Achievement (IEA), IEA Secretariat¹.

Harrison, Dick, 2014. Hur länge har vi ätit potatischips? Historiebloggen. *Svenska Dagbladet* <http://blog.svd.se/historia/2014/09/28/hur-lange-har-vi-atit-potatischips/?fromMobile=true> Publicerad 2014-09-28. Hämtad 2014-10-19. (bearbetad)

Moström, Jerker, 2013. Världens städer växer allt snabbare. SCB. Statistiska centralbyrån. http://www.scb.se/sv/_Hitta-statistik/Artiklar/Varldens-stader-vaxer-allt-snabbare/# Publicerad 2013-10-10. Hämtad 2015-01-08. (utdrag)

Paulsson, Jonas, 2014. Ge barnen havremjölk i stället. *Upsala Nya Tidning*. Insändare. Publicerad 2014-11-04. (bearbetad)

Åström, Karin, 2001. Skorpionen – ett spindeldjur med gadd. I: S. Andersson, K. Åström & S. Rune. *Boken om världen*. Stockholm: Liber. (Utdrag)

Bildförteckning

Lejonet och räven. Eriksson, Inga-Karin, 1993. I: K. Aronsson & S. Ottosson; illustrationer I-K Eriksson & M. Korotyńska, *Min läsebok Blå rosen*. 2. uppl. Stockholm: Liber.

Fotografi på skorpion. Hämtad 2015-06-24
[https://upload.wikimedia.org/wikipedia/commons/6/6d/Emperor_scorpion_or_Imperial_scorpion_\(Pandinus_imperator\).jpg](https://upload.wikimedia.org/wikipedia/commons/6/6d/Emperor_scorpion_or_Imperial_scorpion_(Pandinus_imperator).jpg)

Fotografi på potatischips. Hämtad 2015-02-03
https://pixabay.com/p-476359/?no_redirect

¹Att IEAs skrifter, studiematerial och undersökningar med organisationens tillstånd får användas för forsknings- och utbildningsändamål ska inte tolkas som att IEA medverkat i eller godkänt någon del av forskningen, eller rapporteringen kring den, eller de utbildningsprogram vari materialet används.